

Gelo tu yan kesek yê ku tu nas dikî bûye qurbanê tawanekê?

Nobedarîya qurbanên tawanan alîkarî û agahdarîyan dide te. Em guharîyê dikin, şîretan didin û behsa pêvajoya qanûnî û dadwerî dikin û dibêjin ka çi mafên te hene.

Nobedarîya qurbanên tawanan ya ku alîkarîya qurbanên tawanan, şahidan û kesûkaran dike rêxistineka îdeel û qezencnexwaz e. Alîkarîya me belaş e. Em alîkarîyê dikin bêyî ku em lê binêrin ka tu qurbanê kîjan tawanê yî û bêyî ku hewce bike ku tu polîsan agahdar bikî. Tiştê ku tu ji me re dibêjî em ji kesî re behs nakin.

Nobedarîya qurbanên tawanan ne daîreyeka resmî ye û rêxistina me bi ti partîyên siyasî û alîyên dînî ve ne girêdayî ye. Em bi rêya bi sedan hevkarên perwerdekirî yên xêrxwaz alîkarîya her qurbanê tawanekê, şahid û kesûkarî yê ku li me digere dikin. Mafên mirovî bingehê xebata me ye.

Nobedarîya qurbanên tawanan ji nobedarîyên qurbanên tawanan yên mehelî li seranserî welatî, sekreterîya yekîtîyê û xeteka telefonê ya seranserî ya ku mirov belaş telefonî wê dike pêk tê. Heger tu zimanê swêdî yan zimanê îngilîzî bizanî, tu dikarî telefonî xeta telefona seranserî ya Nobedarîya qurbanên tawanan bikî ji bo ku tu pirsan bikî, agahdarîyan werbigirî yan bi wê rêyê peywendîyê bi kesekî yê ku li nobedarîya qurbanên tawanan ya mehelî bikî da ew hêj alîkarîya te bike.

Nobedarîya qurbanên tawanan alîkarîyê bi gelek zimanan pêşkêş dike. Serdana **www.brottsofferjouren.se/spes** bike da binêrî ka em dikarin alîkarîyê bi zimanê te didin. Ji bo têkilîyê bi zimanê swêdî yan zimanê îngilîzî, tu dikarî jî telefonî xeta telefona me ya seranserî 0200-21 20 19 bikî.

Alîkarîya ku hêzê vedigerîne

Nobedarîya qurbanên tawanan van alîkarîyan pêşkêş dike:

- Alîkarîya însanî ji bal kesekî ve yê ku guhdarîyê dike û fêm dike
- Agahdarî li ser agahdarkirina polîsan, pêvajoya hiqûqî û dadwerî û pirsên bedelkirin û tezmînatan
- Alîkarî di dema mihakemeya mihtemel de
- Alîkarî di dema peywendîkirinê bi daîreyên resmî û şîrketên temînatê

Alîkarîya me belaş e û em dikarin bi gelek zimanan alîkarîya te bikin. Ne şert e ku te polîs agahdar kiribin.

Agahdarîyên zêdetir di malpera me de bixwîne:
www.brottsofferjouren.se/spes

BROTTSOFFER JOUREN 0200-21 20 19

Kurmancî/Kurmanji/Nordkurdiska